Çîyo ke na mesela ser o mordem sey qisaya peyene vajone no yo: Hardê Anadoluye û Mezopotamya tarîxê xo de hem zaf medenîyetî û rindîye hem kî barbarîye û bêbextîya girde dîya. Nê hardî Babîlijî, Iskendero Gird, Roma, Erebi, Moxolî û Osmanî dî. Nêçe rey no hard ame îşxalkerdene, ame vêsnyane. Nêçe rey şarê nê hardî qirkerdiş, surgun û vêşanîye dîye. Nê hardî ser o nêçe medenîyetî royayî (ruwayî), bîyî keweyî, nêçeyî kî rijîyayî. Labelê nê hardî hondê na seserra peyene zulim û bêbextîye kî senik dîyê. Na seserre de nîjadperestîya tirkan pîl ra bi qij bi mîlyonan mordem yan qir kerd yan kî hardê pî û kalîkan ra kerd teber, rusna surgun. Wexto ke Cengê Virên ê Dinya dest pêkerd, nezdiyê çar ra yewê (juyê) şarê Anadoluye xirîstîyan bî. Ceng ke qedîya, nufusê xirîstîyanan amebî se ra 2-2,5.

Se serr a ke nîjadperestîye û şovenîzmê tirkan kurdan ro kî adir vorneno. Kurdî dustê kolonyalîzmê tirkan de, dustê nîjadperestîye û şovenîzmê tirkan de danê pêro, erzenê ra xo ver. No, seserra 20îne de verva nîjadperestîye mucadeleyo tewr amrderg o.

Mordem besekeno vajo ke zîwan û kulturê ke nê hardî ser o yê, tarîxa xo de hondê dewranê nasyonîzmê tirkan barbarîya girde nêdîya. Nîjadperestîye û şovenîzmê tirkano ke ewro ey ra kemalîzm kî vajîno, tarîxê nê hardî ser o qilêrinbîyayîşanê tewr girdan ra yew o. No qilêr sey (zê) nêweşîyêda bêdermane, her roj tenêna zehîr (jahr) keno leşa cematî (toplum) mîyan, virênîya ey keno teng û tarîye.

Qirkerdişê Dêrsimî kî parçeyêde nê qilêrinbîyayîş û xerripîyayîşî yo. Konsolosê Awusturya yê Istanbulî Wînterî, 24ê gulane 1937 de wezîrê karanê teberî yê welatê xo rê nuştayê rusnabî. Wînterî, o nuşte de qalê problemê kurdî û nê problemî ser o polîtîkaya dewleta tirkî kerdê û nîya vatêne:

---

14. Ec, r. 467



## Qate

---

*“Informasyono ke mi çimeyanê (kaynak) saxlemanê tirkan ra gureto, gorê nê informasyonî tersa mi a ya ke jenosîdêde henên bêro kerdene ke qe nêamo diya.yene.”*

Çi heyf (hêf) ke tersê Wînterî rast vejîya û dewleta tirkî Dêrsim de jenosîdêde gird kerd. Kolonyalîstanê tirkan uca têyna şar nêda arê, banan, merkan û areyan de nêvêna û bi dînemîtan, bi qerşunan, bi sungîyan qir nêkerd; înan uca tabîat kî mahf kerd. Hêgayî, rez û baxçeyî, birrî fistî ra ci vêsna; heywanî qir kerdî; mixareyî rijnayî. İnan domanê (gedeyê) zerreyê pîzeyê maye, domanê çewresî, çênê (kênê) azebî, veyvikî, pîr û kalî qir kerdî. Qir kerdî û o ra têpîya kî îlan kerd vat ke “Heydutî amê kîştene”. Seke her tim kenê, pîl û qijê kurdan bi na tore kerdî “heydutî“, qatîlî kî kerdî “qehremanî“. Ma ewro hona kî eynî sîyaset dewam nêkeno?



## PIRO DE MA PIRO DİME

lawo biremerê ver ra,  
xo biresnerê gilê koya.  
xelesîyo ra lekê xo ra,  
kutikê verê çêverê zalima.  
fek kerdo les û cendekê ma,  
her roj her roj weno cayêde ma...

gurex o, luk o fekê xo kefin ra.  
bîyo har, amanîya ma berda.  
desto tal îme; ne çû yo ne kemer a  
ke piro dîme, dûr kuyo ma ser ra...

bîyo heram nan û doyê ma.  
hard û azmen amo pêser seba halê ma;  
no qamçûr o,  
no esker o,  
no tarîyê zîndanî yo...  
hardê xo de bîme macîr,  
hardê xo de bîme niheq ma...

hardê ma ser ra bîyo mexel bê xebera ma.  
weno, şimeno, keno û dano xo ra.  
ma xebetînîme anîme, o weno eşkera-eşkera.  
kes nitawreno şoro feyza dê ra

tirpana xo cêno, çînenno jûver ma.  
bi destê ma, qir keno ma  
xo bi xo kisenîme, ebe destê xo ma.

no nibeno nîya.  
eke niheq îme, vajerê ma ra.  
no nîya çîqa şono kes nizano  
eke rû bidîme ci, ma ra hena zaf çî wazeno...  
naye ti se ci rê kena ver ra?  
piro de ma piro dîme  
ya ma ra ya dê ra...  
no kam o amo hardê ma ser ra merediyo ra,  
awa dera hêgayê ma ser ra birna?..

îndî bes o!..  
no ma rê ne qeder o ne kî îs-kar o  
pîlanê ma, ma ra hertim nîya vato:  
ya hero ya mero...

**Dentz GUNDUZ**

**Mıyanê meselan ra:**

## **TO MA SERFERAZ KERDI**

*Arêkerdox:* **Serdar ROŞAN**

**M**erdimêke beno, lacê jinebîke beno, bay ê rehmet keno. Aw merdim malî durimê ê feqîr beno, ena rey xortêkew weşkek beno. Rocêke şino, rastê keyneyêke yeno. Keyneke dir xeberî dano, vano:

-Ti keyney kamî ya?

Keyna zî hanêna te ra, xortêkew yaqışlî yo, di feqîrî de wo. Ya vana:

-Ez keyney Hakimî ya.

Vano: -Ecêba ez bîrî to bay to ra biwazî, go bay to to nêdo min? Ez day xu bişirawî?

Vana: -Wele bay min, min bido nêdo, zerra min to rê esta. Xeyrê to ez yewî nêgîna.

We û keyneke xeberî danê, badê cû keyneke kê bay xu, kê Hakimî mocnena ra, şina keye.

We yeno keye, day xu ra vano:

-Dayê, şo mi rê keyney Hakimî biwaze!

Day ê te ra vana:

-Lacê mi, ma feqîr ê, çîke ma çin o. Ma go seyîn şêrê keyney Hakimî biyarê? Ma biyarê bikerê ça?

Vano: -Dayê, ti go şêrî Hakimî ra vacî, mi rê biwazî. Ti şo, eleqey to te ra çinîk o.

Cînike wirzena we, verê xu şana kê Hakimî, şina kê Hakimî de nişena ro. Hakim cîniya xu ra vano:

-Ena cîniya feqîre kam a? Ma tesedîq-mesedîq bidê ci.

Ya vana:

-Nê, ez nêamiya tesedîqan bigîrî. Ez hamiya ke ti keyney xu bi qewlê Resûlê Hoday bidê lacê min.

Hakim vano:

-Şima feqîr ê, banê şima çin ê, şima îdaresiz ê; ez go keyney xu ça ra bidî lacê to?

## Vate

---

Vana: -Mal barê Homa de esto. Eger ti bidê, Homa teala wo, belkî îşê ma zî baş bo. Zerrey keyney to û lacê mi jobînan rê esta.

Hakim cîniya xu ra, keyney xu ra perseno. Keyna vana:

-Zêdey ay lacî ez yewî nêgîna.

Vano: -Keyney mi, ê feqîr ê. Gunay to milê to de, ez go to bidî la lacek feqîr o. Ti go zehmetî bancê.

Vana: Bayê, mi bide ci. Homa eger mal bido, mal barê Homa tealay de zehf o.

Hakim wirzeno we, suyê ê yeno, dano ci, vano:

-Bigî bere.

Cînike keyneke gêna lacê xu rê ana. Marey îne dana birnayîşî, xu rê zewecênê.

Keyneke lacekî ra vana:

-Şore hîni rêş bigîre, ez zana secedan virazî. Eno senet destê mi de esto.

Lacek şino rêş gêno. Keyneke virazena, lacek beno roşeno. Ana secdan virazena ku tu kesêke miyanê bajarî de nêşkeno ay secdan virazo, bajarê Silêmanye de. Piçe halê îne beno weş.

Wirzenê we, rocêke xu rê banêke zey koşkêke virazenê.

Keyneke rocêke kefiyeyke weşe îpek ra, yanî birîşm ra virazena; pêşena, kena miyanê çıyan, gêna dana ci, vana:

-Ti go ena kefiya berê bidê lacê Mîrê Hekaryan. Go xelatêke başe bido to, ti ma rê biyarê.

Lacek vano:

-Wa bo.

Lacek kefiya gêno, beno dano lacê Mîrê Hekaryan. Lacê Mîrê Hekaryan wexta keno a, hanêno te ra ku kefiya newîne di dinya de nêameya viraştişî. Kêfê ê zehf yeno. Kerîke pes dano lacekî, vano:

-Xu rê bigî bere.

Lacek ay kerî pesî şaneno verniyey xu, yeno. Pes o, nata şino wata şino, mêşin o, rehîr ro nîno, zehmet pa vînenno. Hanêno merdimêke rastê ê yeno, di hebî gayî verniyey ê de. Vano:

-Ti ça ra yenê?

Vano: -Ez Hekarî ra yena.

Vano: -Ti enî pesî se ra benê?

Vano: -Ez bena Silêmanyê.

Vano: -Ti zehmet enî pesî wa vînenê. Ez enî wir dî ganê xu bidî to, ti enî kerî pesî bidê mi seyîn o?

Vano: -Wele çikew baş o. Ez zî zehmetê enî pesî ra feletêna.

Wirzeno we ay kerî pesî teslîmê ê keno, ay wir dî gan şaneno verniyey xu. Qederêke yeno, hanêno merdimêke esparê estorêke yeno. Vano:

-Ti ça ra yenê?

Vano: -Ez Hekarî ra yena.

Vano: -Ti şîbî çî?

Hal û meseley xu ci rê sere ra vano.

Merdimo espar xu bi xu vano “eno merdimêke aqilê ê zehf ca de niyo, ez go ê bixapênî“. Vano:

-Enka ez ena estore bidî to, ti enî wir dî gan danê mi?

Vano: -Wa bo, ez dana.

Wirzeno wir dî gan dano ay merdimî, nişeno estore. Xu bi xu vano “ena rey ez go xu rê bi rehetî şîrî keye“.

Yeno hanêno merdimêke di hebî zerecî te dir ê, şîno seyde. Silam dano, we vano:

-Eleykum silam.

Vano: -Ti ça ra yenê?

Lacek meseley xu te ra vano.

We xu bi xu vano “wele eno merdimêke saf o, ez go enî wir dî zerecan bidî ci, estore te ra bigîrî“. Vano:

-Ez enka enî wir dî zerecan bidî to, ti go estore bidê mi?

Vano: -Wa bo, ez dana.

Wirzeno we estore dano ci, wir dî zerecan gêno, qefesanê îne erzeno milê xu, dano rehîr yeno. Yeno fekê berê xu, hema şefeqî nêdawo, şewe nîme wa. Vano “wele ez cîniya xu rehetsiz nêkena, nêdana berya ro, wa cîniya mi rehetsiz nêbo; hetê serê sibay wexta ya wişte we nimaj, a gavî ez go şîrî diyar“. Verê berya de serey xu nano serê çeperê berî, vezelêno. Wir dî zerecanê xu, kiştâ xu de nano ro.

Hanêno bî ringe-ringa başbazirganî -tabî koşka ê zî kiştâ bajarê Silêmanyê de ya, koşkêke weş a-, başbazirgan ame verê koşka ê de

barê xu nay ro. Hame barê ê.

Eno wişt we. Îne agir kerd we, şî barê îne. Ardî wir dî zerecê xu sere birnay, goştê îne kebab kerd, da verê îne, îne goştê xu werd. Başbazirganî te ra va:

-To enî zerecî ça ra ardî?

Ê hal û meseley xu sere ra behs kerd. Başbazirganî va:

-Ez û ti ma şertêke bikerê. Enka şefeqê go cîniya to wirzo we, ez û ti ma go şêrê. Ez go fekê berî teber a vinderî, ti şo zere barê cîniya xu; cîniya xu ra enî hedîsey xu vace. Vace “mi kerî pesî girot, mi da bi gan, gay mi day bi estore, estore mi da bi zerecan û zerecî zî mi başbazirganî rê sere birnay.” Eger cîniya to to dir da pêro, ti go ena koşke piya bi cîniya xu wa teslîmê min bikerê; nê nê eger to dir nêda pêro, ez go enî qantiranê xu bi enî baranê xu wa teslîmê to bikerî.

Vano: -Wa bo.

Şefeq dano, cîniya ê wirzena we desmac gêna, îne verê berya de vîna. Ê danê berya ro. Ya berya kena a, we şino zere. Bazirgan teberê oda de vindeno.

Cîniya ê vana: -Ti bi xêr amey.

Vano: -Miyânê xêrî de bi.

Vana: -To se kerd?

Vano: -Wele ez şîya barê lacê Mîrê Hekaryan, min kefiya da ci; zehf keyfê ê ame, ê kerîke pes da mi, mi kerî pesî ard.

Cînike va: -Baş o. Ez go şîrî bêrî, ay pesî bidoşî. Pekî to se kerd aw pes?

Va: -Wele mi pes da, di hebî gay girotî.

Cînike va: -Baş o. Ti go cite bikerê, ma go xu rê debir wedarê. To zehf baş kerdo.

Va: -Wele mi ay gay zî day.

Cînike va: -To day bi çî?

Va: -Mi day bi estore.

Cîni va: -Zehf baş o. Ma go xu rê binişê ci şîrê gezmax, bigeyrî.

Va: -Wele mi estore zî da.

Va: -To da bi çî?

Va: -Mi da bi di hebî zerecan.

Cînî va: -To zehf baş kerdo. Ti go şêrê seyd, ma rê zerecan biyarê, ma go goştê zerecan borê.

Va: -La zerecî, meymanê min amey, başbazirgan, mi ci rê sere birnay.

Va: -To çîkew zehf baş kerdo. Kê Homay awan bo. To ma serferaz kerdî, to goştê zerecan da meymananê ma.

Başbazirgan berya keno a, vano:

**-Bêre** qantiranê xu **bigîre**, barxananê xu bigîre; heme çî teslîmê to!

Heme çî teslîmê lacekî keno, lacek beno en zengînê bajarê Silêmanyê.

Hakim pêhesêno ku zamayê ê ende biyo zengîn, we û cîniya xu wirzenê we şinê kê îne. Vano:

-Wele heqîqet mal barê Homay de zehf o. Wexto hes bikero, bi her hawey dano însanî, însan beno dewlemend(\*).

**agir:** adir

**ana:** ena, êna, ina, wina; hinî

**aw:** o

**Aw merdim feqîr beno.** (O merdim feqîr beno./Ay mêrdim feqîr beno.)

**barê** (kurmanckî de “bal“, “li ba“): hete

**Mal barê Homay de zehf o.** (Mal Homay hete zaf o.)

**berya:** ber, keyber, kêber (çêber), kêver (çêver)

**bêre** (ti bêre): bê (ti bê)

**bigîre** (ti bigîre): bigîri (ti bigîri), bigî (ti bigî), bicê (ti bicê)

**ça ra:** kotî ra, kure ra, kura ra

**dewlemend:** pêt, zengîn

**di ... de:** de, di

**di dinya de:** dinya de, dinya di

**diyar:** cor

**gav:** game

**go:** do, ko

**Go cîniya to wirzo we.** (Do cîniya to werzo. /Ko ceniya to wardo.)

**hîntî:** biney, tikê

**mêşine:** mêşna, mîye, mey

**min:** mi

**zerra min:** zerra mi

**newîne:** enasar, enawa, no tewir, nêwîn

**nênê:** eke nêbo

**piçe:** tikê, biney

**serferaz:** serfiraz

**sû:** hêrs

**Suyê ê yeno.** : Hêrs beno.

**wir:** her

**wir dt:** her di

**wişt we** (eno wişt we): werişt, wurişt (no werişt)

**wişte we** (ya wişte we): a werişte, a wurişte

\*Mi na mesela sey vatişê yew camêrdê Hezaniji nuşte.

## Abdulmuttalip KOÇ

### XÛNIMA MIN A

Serê bûnî ma tuyer î  
Binî bûnî ma tuyer î  
Tuy yîn omê sipyê surî  
Xûn rişnena, ma tuy burî

Ax Xûn Xûnê xûnima min a  
Ti hêvîya ser zerrê min a  
Wesar yenû ti vilê min a  
Payîz yenû ti surgulê min a

Kuê Kurdîstanî seraser î  
Emnûn yenû vor ha serî  
Warê ma wir dî beraber î  
Xûnê mi bîya waharî birrî

Ax Xûn Xûnê xûnima min a  
Ti hêvîya ser zerrê min a  
Wesar yenû ti vilê min a  
Payîz yenû ti surgulê min a



Serê bûnî ma guwazêr î  
Binî bûnî ma guwazêr î  
Qalinî Xûn bidî suez bigirî  
Payîz bîyerû ez Xûn birî

Ax Xûn Xûnê xûnima min a  
Ti hêvîya ser zerrê min a  
Wesar yenû ti vilê min a  
Payîz yenû ti surgulê min a

Almanya, 15. 04. 1998

**bûn:** ban  
**emnûn:** hamnan  
**guwazêr:** gozêre  
**omeyîş:** amayene, ameyîş  
**qalin:** qelen  
**suez:** soz  
**vor:** vewre  
**wahar:** wayîr  
**wesar:** wisar  
**wir dî:** her di  
**yin:** înan

## STANDARDIZEKERDIŞE KIRDKÎ SER O ÇEND VATEYÎ

Memo DARREZ

**H**ûmara çarina kovarê Vateyî (wisar 1998) di nuştox Cemîl Gundogan (CG) pers û problemanî lehçeyê (lehçeya) kirdkî (kirmanckî) ser o vindenû û gerre û gazînan kenû ke çira kesêk na mesela ser o nêvindenû. Ez nuştişî CG ciddî vînena û na bawêrî di ya ke na mesela ganî her hetî ra hîra bêrû munaqêşekerdiş, qê ke<sup>(1)</sup> hem cematî kurdan viraştiş û awankerdişî dezgehanî miliyan di prosesê destpêkerdişî di yo hem zî lehçeyê kirdkî prosesê standardizekerdişî ra vêrena ra. Yenû zanayîş ke kirdkî warê nuştişî di warî emrêkî dergî nîya<sup>(2)</sup>.

Ger wendoxî nê hîrê îddiayan<sup>(3)</sup> ke mi cor di kerdî la ra, qebul bikerî, dewam di guri benû rehet: O wext lizum nîkenû ez qê (semedî) hîremi îddiayanî xo argumentan bibînû (bivînû). Guri hinîya benû rehet ger şaro ke kirdkî qisey kenû hayê ey nê hîremi îddiayan ra bibû. Çira? Ê tîyedire<sup>(4)</sup> lez kenî ke teverî (teberî) na prosesi di nîmanî. Yenû zanayîş, viraştê Homê<sup>(5)</sup> împaratoriyê Medya di ciwîyenî û na dinya di her çî sey birûskî vîyerenû ra û sey cemedî heliyenû, reng bedilnenû.

Esasî xo di meselaya ke CG nuştişî xo di munaqêşe kenû, krîzêka ruhî ya ke mîyanî şarî<sup>(6)</sup> di, zaf zî mîyanî haydaran di, esta. Krîz eşkena xo nê persan di bimuejnû ra (binawno): Ma kam î? Ma ayî ke xo ra vanî

---

1. qê ke: çimkî, semedo ke

2. nîya: nêya

3. Iddîa 1: Dezgehî milî cematî kurdan di newe awan benî.

Iddîa 2: Lehçeyê (lehçeya) kirdkî hemo newe standardize bena.

Iddîa 3: Lehçeyê kirdkî hetî nuştişî ya warî emrêkî dergî nîya.

4. tîyedire: pîya, heme

5. Homa: Heq, Ella

6. Tîya di vatê «şar»î ame nuştişî rî na yew ra ke na mesela eşkena her kesî rî nerehetî virazo.

“kurd“ çira ziwanê yewbîn ra fam nîkenî? Goreyê mi sebêbî na krîz tarîxî yo: Kurdan bi kirdkî nînuştû<sup>(7)</sup>, sey ziwanêko nuşte kirdkî aver (eravê) nêberdû û na yew re nêbiya warî rûmetî. A her wext sey qijêka sêwir (sêkurr) menda û erzîyawa quncikêka tarî ke çoyî (çewî) nîdiya. Ewro wexta ke tayê merdimî anîyenî şaro ke kurmanckî qisey kenû zaf o û kurmanckî hinîya warî rûmetêkî girdî ya, tedîrgîn benî, tersenî û wazenî xo bi nameyêko bîn bidî şinasnayîş. La ê naye (inê) kenî xo vîr ra ke bînatê rewşê **kurdkî** û **kurmanckî** di zaf ferq esto. Kurmanckî zî parçeyêkê kurdkî ya. Reaksîyonî bi no celeb zî ganî normal bêrî diyyayîş; meseleyê nêwîn (enasarênî) her millet di virazîyê, virazîyenî. Muhîm na ya ke na krîz çî qeydi hal bena? Nuştişî CG zî tîya di muhîm o. Yanî krîza ke esta çî qeyde hal bena?

### Derman

CG nuştişî xo di wazenû krîza ke mi bi *krîza ruhî* name kerd, teşxîs bikerû û ci rî derman bibînû. Dermanî aye îdê û perspektîfî newê ke esasî xo waştişî di prensîbanî îlmî ra genî. La nê prensîbî nuştişî ey di îlmî nîyamê munaqêşkerdiş û derecê waştişî di mendî, herçend ke ey xêlêk cerebnû zî. Na yew ra mi waşt bi di meseleyan nê îdeyan aver bera.

A verîn, ê bawerîyî ke averşîyayîşî (eravêşîyayîşî) ziwanî ser o estî. A bîn zî çî celeb ziwanî estî? Nika ti bi ziwanêk qalî kenî, bi ziwanêk zî nusenî. Mesela CG behsî ziwanêkî standardîzekerdi kenû.

Averşîyayîşî ziwanî warî di teorîyan o:

#### **Teorî 1**

Teorîyê dînî: Esasî xo nuştişanî dînî sey Quran, Incîl û Tewratî ra genû. No teorî, ziwanî sey pakêtêka hadirikerdi û piştî vînenû. Ê ke zerrê paketi di yê tamam bîyaye yê, tekamul bî. Ayî ke paket viraşta û tîyew arda û şarî rî erşawita (rusnaya) Homa yo. Mesela ziwano ke Adem û Hewa qisey kenî, ziwano ke ez û CG qisey kenî. Dînê musulmanan di vateyê ewilî “biwan“ o. Paket aker, ti te di herçî vînenî. Yanî ziwana her wext bibi û hertim sey ewroy dolmend bi.

---

7. Çira? Ganî na mesela bêro fikirîyayîş û munaqêşkerdiş.

## Teorî 2

Teoriyê Darwînî: Rîya ke sekularî yenû fikirîyayîş û bawerî bi averşîyayîşî (eravêşîyayîşî)<sup>(8)</sup> yenû kerdiş. Derheqî ziwani di no teorî hîna yenû famkerdiş: Ziwan wext dire xo aver berdû. Merdimanî vêrînan, merdimanî dewrî kerran nîşkên ziwaneke rind, kamil, sey eyê ke şarî ewroy qisey kenû, virazî, çimkî vatê înan dolmend nêbî. Ê înan zafî sey vengani bi. İnan bi wasitê vengani yewbîn ra fam kerdê. Mesela yenû texmînkardiş ke vatê “kerra“ (kemere) sey vengani “k“, “e“, “r“, “r“, “a“ amên îdraqkerdiş.

Bi kilmî: No teorî bawer kenû ke averşîyayîşî ziwani bi averşîyayîşî şûûrî merdiman dire, têver ra<sup>(9)</sup> şîyû. Yanî merdimî vera-vera bî haydar û bi şûûrî înan zî ziwani înan aver şîyû. No hetî averşîyayîşî ziwani yo, heto bîn zî ê famkerdişî ziwani yo. Merdim çendêk eşkenû ziwani ke qisey kenû fam bikerû.

Wendoxî hayikî bêşik îdraq kenî ke bînatê şûûrî ewroyî û vîzîyerî di ferq esto. Merdimî ewro bi averşîyayîşî îlmî hinîya zaf eşkenî çîyo ke vînenî îfade bikerî, mena bidî qîsanî xo, hîssan û fikirani xo bi vatani dolmendan îfade bikerî.

Mesela ez zana ke vatê “kerra“ warî di menayan o:

Mena 1

Vatê kerra vengani “k“, “e“, “r“, “r“, “a“ ra amo viraştîş. Wexta ez vana “kerra“, nê vengî fekî mi ra yenî tever. Mena yewine hetî vatê kerra yê îfadekerdişî yo.

Mena 2

Menaya ke nê vengî hişê merdimî di peyda kenî. Ez zana kerra wişk a, dejnena... Na mena rismêko mental ke hişî di virazîyenû wexta ez dîqetî xo ancenû cismeka sey kerra ser. Mena diyine, hetî vatê kerra yê menakerdişî yo. La mena yewine û diyine pîyewanaye yê û nîşkenî bîyerî çîyewkerdiş. Ê CG û ez, ma her di eynî wexti di fam kenî ke vatê kerra çî yo, çimkî ma her di bi yew ziwani bîy pîl.

Ez çira zana her vate warî di hetan o: hetî îfadekerdişî, hetî

---

8. Averşîyayîş (eravêşîyayîş): Verî her çî tepîya bi, primitîf bi, bi wext aver (eravê) şî.

9. têver ra: paralel

menakerdişî?

Cewab: Rîyî Ferdînan de Saussureî<sup>(10)</sup> re.

Teorîyî corînî dîrekt ez meşxulî standardîzekerdişî kirdkî, ke esasî nê nuştişî tayîn kenû, kerda. Ziwanî standardîze benî, la kancî ziwani?

### Hîrê celeb ziwani

**Ziwano tebî:** Ziwano ke her kes bîyayîşî xo ra tepîya musenû yo. Ziwanî mi, CG, Ibnî Xeldûn, Çar Nîkolaî, Mr Boris, Xalîsa û Kekî. CG nê ziwani Dersîm di muso, Çar Nîkolaî Rûsya di, Xalîsa zî dewê Şargî di. Wendoxî hayikî pê hesîyê ke ez û CG bi eynî ziwani tebî qisey nîkenî û nînusenî.

**Ziwano standardîzekerdi:** Viraştiş an zî tîyewardîşî ziwane k wertaxî yo. Ziwane ko wertax yenû viraştiş ke şaro ke yew welat yan zî mintîqa di ciwîyenû nê ziwani ra fam bikerû. CG û hevalî (embazî) ey nika xebitîyenî ke ziwane bi nê şiklî virazî qê mi, ti, ey, înan ke kirdkî qisey kenî<sup>(11)</sup>.

**Ziwano argo**<sup>(12)</sup>: Yenû bawerkerdiş ke her ziwani di estî. Ziwanî komêk. Nuştoxanî sey Aîskylos<sup>(13)</sup>, Sofokles, Sheakspear gurênayû (şuxilnayû). Kirdkî di vatê “Xalto rep”<sup>(14)</sup> tîya di tam cayê xo genû. Wext yenû ziwano standardîzekerdi vatanî ziwani veradayan (beredayan) qebul kenû û îfadê veradayan zerrê ziwani di cayê xo genî. Ez na minasebet ra veradayan pîroz kena. Bextewar bèn gelê veradayeyê dinya!

CG û embazî ey xebitîyên ke ziwani kirdkî standardîze bikerî. Qê standardîzekerdişî ziwani kam qerarî şertan danû? Strukturî sosyal û cografikî ke cemat di yê. Nê qerarî zaf dorî (reyî) polîtîk-îdeolojik î û gorê qîwetî polîtîkaya ke cemat di hakim a yenî tesbît kerdiş. Tîya di polîtîka ganî her wext sey polîtîkaya ke partîyî polîtîkî kenî nîyerû famkerdiş. Rey-rey kitabêk gramerî eşkenû ay bînan (kitabani bînan ê

10. Jeffersen and Robey, Modern Literary Theory, A Comparative Introduction

11. Qê nimûne biewnîre (banî): Kovara Vate, hûmar: 4, wîsar 1998, r. 4

12. Ziwanî pêxwasan, raşîyayan, derbederan, serserîyan...

13. Mesela eserê Sofoklesî trajediyê Oidîpusî di no ziwani esto.

14. No vate mintîqê Bongilanî di namdar o.

derheqî gramerî di) ra zîyedêrî veng bidû. Mîsala muhîme: Kurmanckî di qê standardîzekerdişî ziwani di yew kitab zî nêresa ê Celadet Bedirxanî. Gramerî ey nika sey qanunanî esasîyan yenû qebulkerdiş. Kesê ke qê pêserancitiş û tîyewardişi kirdkî amê yew ca û hemo zî xebatê înan dewam kena zî warî polîtîkêk î. Û înan gorê na polîtîka her panc kombîyayîşanî xo di xêlêk qerarî<sup>(15)</sup> girotî û xebitîyên ke himo qeraranî newan bigêrî<sup>(16)</sup>.

Na xebatê înan cayê xo gena, nê şîretî înan qê standardîzekerdişî kirdkî benî bingeh. Formî kancî fekî hêdî-hêdî giraniyê xo nuştayanî kirdkî di muejnenû ra, wext muejnenû ra. La a muhîm na ya: Standardîzekerdiş an zî tîyewardişêko bi no qêde warî heqî yo, warî heqî nîyo? Cewab: Nê. La hetî tîyewardişi ziwani di tu millet zî nişkena behsî heqî bikerû. Standardîzekerdişî ziwani vîjnayîşêk (weçînayîşêk) an qerarêko polîtîk-îdeolojîk o û mecburîyetî ver yenû girotiş. Ideal o yo ke herkes bi ziwani dewê xo, mehelê xo, bajarî xo binusû la no zî nê wextî rî kafi nîyû. Heto bîn ra ger ez na mesela di bigêra heq mera heyatî xo ra fek raverdû, çimkî hemi heyatî mi gorê qanunî viraştan amo tîyewkerdiş.

Pênî di: Ziwan objeyêko sabît nîyo û tim û tim binî derbanî bedelnayîş û averşîyayîşî di yo. Vateyî û îfadeyê neweyî kuwenî mîyanî ziwani, ê konî yenî vîrrakerdiş, benî vîn. Wexta hemi xebatê dest û doşîyanî merdiman bî, cemat cematî cit û pesî bi, tirpan, moşeni û durmix muhîm bî, la dewrî fuzeyan di kam moşeni şînasnenû? Na girêdayeyê sewîyê averşîyayîşî û wextî ya. Ziwan û şuûrî merdiman têver ra şinî. Ziwan her ke wext şinû bi dîyayîş û kifşkerdişî aletanî newan û şuûrî merdimatî dire benû hîra û dolmend.

Qêdnayîş di şîretêk: Kom û cematî ziwani xo aver benî. Ganî şarê ma zî aver şîyerû. Qê averşîyayîşî, şuûr, hîrafikirîyayîş, qebulkerdişê renganî cîya-cîyayan (rengî ke nîmanenî yewbîn) lazim o. Tengfikirîyayîşî dinya -ê raştîya ke te di yenû ciwîyayîş- kendişî çalê xo bi xo yo.

---

15. Wendox ganî nê qeraran hemo sey şîretî bibînû.

16. Biewnîre: Kovara Vate, hûmar: 5

## FERHENGË TIRKI-KIRMANCKI (ZAZAKI)-IV

### TÛRKÇE-KIRMANCCA (ZAZACA) SÖZLÛK

#### MALMISANIJ

#### *Kilmnuşteyî*

- b** biewnîre, nîyade  
**m** makî (feminin)  
**n** nêrî (masculin)  
**ûsn** û sey nînan  
**z** zafhûmar (pluriel)

#### *Suffiksî*

- e (-ye)** suffiksê makîye

#### **A**

- acı:** dej (n)  
**acımak:** dejayene  
**adıl:** zemîr (n)  
**ağrı:** dej (n)  
**akın:** hêriş (n), gale (m), galim  
**akın etmek:** hêriş kerdene, gala ...  
kerdene, galim kerdene, galime pira nayene  
**alarm:** alarm (n)  
**alarm çalmak:** alarm cenayene  
**alarm vermek:** alarm dayene  
**alay:** alaye (m)  
**alman** (tüfek): aleman (n)  
**antitank:** antitanq (n)  
**antreman:** antreman (n)  
**arasıra:** rey-rey  
**artedat:** peyedat (n)  
**artikel:** artîkel (n)

**asal sayılar:** hûmarnameyê bingeyî

**asayîş:** asayîş (n)

**asker:** leşker, -e

**askerî:** leşkerî

**askeri bütçe:** butçeya leşkerî (m)

**askeri cip:** cîpa leşkerî (m)

**askeri hizmet:** xizmeto leşkerî (n)

**atîş yeri:** b. silah atîş yeri

**atlı:** espar, -e; suwar, -e; suwarî (n), suwarîye (m)

**atom:** atome (m)

**atom bombası:** bombaya atome (m)

#### **B**

**baça:** lojine (m)

**bağlaç:** bestox (n)

**bakmak:** nîyadayene

**bak:** nîyade

**barut:** barut (n)

**barut hakkı:** heqê barutî (n)  
**basit:** sade  
**basit cümle:** cumleya sade (m)  
**basit fiil:** karo sade (n)  
**basit kelime:** çekuyo sade (n)  
**basit sözcük:** çekuyo sade (n)  
**basit sıfat:** sifeto sade (n)  
**batarya:** batarya (m)  
**bayrak:** beyraçe (m), ala (m)  
**bazuka:** bazûka (m)  
**belgisiz sıfat:** sifetê nedîyarîye (n)  
**belgisiz zamir:** zemîrê nedîyarîye (n)  
**belirtili:** dîyar, -e  
**belirtili isim tamlaması:** îzafeya nameyî ya dîyare  
**belirtisiz:** nedîyar, -e  
**belirtisiz isim tamlaması:** îzafeya nameyî ya nedîyare  
**belirtme sıfatı:** sifetê dîyarkerdene (n)  
**beşli** (tüfek): bêşlî (n)  
**bileşik:** pêrabeste (n), pêrabestîye (m)  
**bileşik cümle:** cumleya pêrabestîye (m)  
**bileşik fiil:** karo pêrabeste (n)  
**bileşik kelime:** çekuyo pêrabeste (n)  
**bileşik sıfat:** sifeto pêrabeste (n)  
**bileşik sözcük:** çekuyo pêrabeste (n)  
**bit:** espîje (m)  
**bomba:** bomba (m)  
**bomba atmak:** bomba eştene  
**bomba koymak:** bomba dekerdene  
**bomba patlatmak:** bomba teqayene  
**bombalamak:** bomba kerdene  
**bombalanmak:** bomba biyene  
**bombardıman:** bombarduman  
**bombardıman edilmek:** bombarduman biyene  
**bombardıman etmek:** bombarduman kerdene  
**bot:** bote (m)

**bunu:** 1)ney (n) 2)naye (m)  
**bunları:** nînan  
**bükümlü:** ante (n), antîye (m)  
**bükümlü ad:** nameyo ante (n)  
**bükümlü dişil isim:** nameyo anteyo makî (n)  
**bükümlü eril isim:** nameyo anteyo nêrî (n)  
**bükümlü isim:** nameyo ante (n)  
**bYtçe:** butçe (m)  
**büyük:** 1)gird, -e 2)pîl, -e 3)xişn, -e  
**büyük harf:** herfa girde (m)

## C

**cemse:** cemse (m)  
**cephane:** cebîlxane (n)  
**cins ad:** nameyo cins (n)  
**cins isim:** nameyo cins (n)  
**cip:** cîpe (m)  
**cümle:** cumle (m)  
**cümlenin yapısı:** awankerdişê cumle

## Ç

**çare:** çare (n)  
**çaresiz:** bêçare  
**çekilmek:** ancîyayene  
**çekim:** antiş (n)  
**çoğul:** zafhûmar  
**çoğul ad:** nameyo zafhûmar (n)  
**çoğul isim:** nameyo zafhûmar (n)  
**çünkü:** çike

## D

**darbe:** çewr (n), derbe (m)  
**darp yarası:** birîna çewrî (m), birîna derbe (m)  
**denizaltı:** bota binawe (m)  
**derman:** derman (n)  
**dermansız:** bêderman, -e  
**Dersimli:** dêrsimij, -e  
**dilbilgisi:** gramer (n)  
**di'li geçmiş zaman:** demo vîyarteyo dîyar (n)



**dişil:** makî (m)

**dişil ad:** nameyo makî (n)

**dişil isim:** nameyo makî (n)

**durum:** rewş (n)

**durum zarfı:** zerfa rewşî (m)

**düzenli:** biserûber, -e; întûzamin, -e, nîzamin, -e

**düzensiz:** bêserûber, -e; bêîntîzam, -e; bêînzam, -e

## E

**-e:** 1)bi

Diyarbakır'a gidiyorum. (Ez şina bi Dîyarbekir.)

Tanrı'ya inanmışsın. (To îman bi Hûmay ardo.)

2)rê

Kime? (Kamî rê?)

Bana. (Mi rê.)

**-e doğru:** ver bi

Diyarbakır'a doğru gidiyorum. (Ez şina ver bi Dîyarbekir.)

**edebilmek:** şayene (şayîş), eşkayene (eşkayîş), besekerdene

**edilgen:** passîf, -e

**edilgen fiil:** karo passîf (n)

**egemenlik:** bandure (m)

**el bombası:** bombaya destî (m)

**emir kipi:** raweya fermanî (m)

**emniyet:** asayîş (n)

**eril:** nêrî (n)

**eril ad:** nameyo nêrî (n)

**eril isim:** nameyo nêrî (n)

**erkek çocuk:** lajek (n)

**eşanlımlı:** hemmana

**eşanlımlı kelime:** çekuyo hemmana (n)

**eşanlımlı sözcük:** çekuyo hemmana (n)

**eşsesli:** hemveng

**eşsesli kelime:** çekuyo hemveng (n)

**eşsesli sözcük:** çekuyo hemveng (n)

**etken fiil:** karo aktîf (n)

**eylem:** kar (n)

**eylem cümlesi:** cumleya karî (m)

## F

**fiil:** kar (n)

**fiil cümlesi:** cumleya karî (m)

## G

**geçişli fiil:** karo transîtif (n)

**geçişsiz fiil:** karo întansîtif (n)

**gelecek zaman:** demo ameyox (n)

**genel:** pêroyî

**genel asayîş:** asayîşo pêroyî (n)

**genel emniyet:** asayîşo pêroyî (n)

**genel güvenlik:** asayîşo pêroyî (n)

**gentiş:** hîra

**geniş zaman:** demo hîra (n)

**gereklilik kipi:** raweya ganîfyê (m)

**gibi:** 1)sey

O solgun bir çiçek gibiydi. (A sey yew vila pulisîyaya bî.)

Ben senin gibi değilim. (Ez sey to nîya.)

Delikanlı erkekçe (yiğitler gibi) direndi.

(Xortî sey camêrdan xo ver ro da.)

2)se

Kar gibi beyazdır. (Sipî yo se vewre.)

O kadar yumuşak ki, pamuk gibi. (Ehende nemr o ke, se peme.)

3)seke

Senin de bildiğin gibi oğlan bugün hastadır. (Seke ti zî zanî lajek ewro nêweş o.)

**gizli:** nimite (n), nimitîye (m)

**gizli özne:** kerdoxo nimite (n), kerdoxa nimitîye (m)

**güvenlik:** asayîş (n)

**H**

**hakimiyet:** bandure (m)  
**hayat:** heyat (n)  
**hazır ol!** (emir): amade be!  
**hem ... hem:** hem... hem...  
 Hem gider, hem ağlar. (Hem şına hem bermena.)

**her:** her

**her iki:** her di  
**her ikisi:** her di, her diyan  
 Her ikisi okudu. (Her dîyan wend.)  
**her kes:** her kes  
**her gün:** her roje

**hidrojen:** hîdrojene (m)

**hidrojen bombası:** bombaya hîdrojene (m)

**hizmet:** xizmet (n)

**hücum:** hêriş (n), gale (m), galim

**hücum etmek:** hêriş kerdene, gala ... kerdene,  
 galim kerdene, galime pira nayene, rami-  
 tene ser

**I**

**idman:** îdman (n)

**ikaz:** balantiş (n), îqaz (n)

**ikaz etme:** balantiş, pêhesnayîş, îqazkerdiş

**ikaz etmek:** bal antene, îqaz kerdene

**ilçe:** qeza (m)

**intizamlı:** biserûber, -e; întîzamin, -e, nîzamin, -e

**intizamsız:** bêserûber, -e; bêîntîzam, -e, bêtî-  
 zam, -e

**isim:** name (n)

**isim cümlesi:** cumleya nameyî (m)

**isim tamlaması:** îzafeya nameyî (m)

**istek:** waştene

**istek kipi:** raweya waştene (m)

**ister ... ister:** ha... ha...

İster ben, ister sen, farketmez. (Ha ez ha ti,  
 ferqê nêkeno.)

**işaret:** nîşan (n)

**işaret sıfatı:** sifetê nîşankerdene (n)

**işaret zamiri:** zemîrê nîşankerdene (n)

**iyelik:** wayîriye (m)

**iyelik adılı:** zemîrê wayîriye (n)

**iyelik zamiri:** zemîrê wayîriye (n)

**J**

**jandarma:** cendirme (n)

**K**

**kalbur:** pirojine (m)

**kanat:** bask (n), perr (n), pol (n)

**sağ kanat:** basko rast (n), perro rast (n),  
 polo rast (n)

**sol kanat:** basko çep (n), perro çep (n),  
 polo çep (n)

**kara:** erd (n), bej (n)

**karar:** bire (m), qerar (n)

**karar almak:** bire girewtene, qerar  
 girewtene

**karar vermek:** bire dayene, qerar dayene

**karara bağlamak:** bire dayene, qerar da-  
 yene

**karargah:** qerargehe (m)

**karasal:** erdî, bejî

**karşılaştırma sıfatı:** sifetê pêveronayîşî (n)

**kavga:** lej (n)

**kavga etmek:** lej kerdene

**kelime:** çeku (n)

**kentli:** şaristanij, -e

**kere:** rey

**bir kere:** reyke, reyê

**kesir sayılar:** hûmarnamê kesîrî

**kez:** rey

**bir kez:** reyke, reyê

**Kırmanc:** kirmanc, -e

**Kırmancca:** kirmancî

**ki:** ke

Siz söyleyin ki biz de söyleyelim. (Şima vajê-ne ke ma zî vajî.)

**kip:** rawe (m)

**kol:** bask (n), perr (n), pol (n)

**sağ kol:** basko rast (n), perro rast (n), polo rast (n)

**sol kol:** basko çep (n), perro çep (n), polo çep (n)

**konuşmak:** qisey kerdene, qesey kerdene

**köylü:** dewij- e

**kurallı fiil:** karo qaydeyin (n)

**kuralsız fiil:** karo bêqayde (n)

**kuru üzüm:** eskije (m)

**küçük:** qij, -e, hurdî, -ye

**küçük harf:** herfa hurdiye (m)

**Kürdistan:** Kurdîstan (n)

Kürdistanımız: Kurdîstanê ma (n)

**Kürt:** kurd, -e

**Kürtçe:** kurdkî

**L**

**laf:** qisa (m), qesa (m)

**M**

**mastar:** mesder (n)

**medeni:** medenî, -ye

**mekan:** ca (n), mekan (n)

**millet:** millet (n)

**milletimiz:** milletê ma (n)

**mişli geçmiş zaman:** demo vîyarteyo nedîyar (n)

**muhafız:** muhafiz, -e

**muhafız alayı:** alaya muhafizî (m)

**muktedir olmak:** şayene (şayîş), eşkayene (eşkayîş), besekerdene

**müdire:** mudire (m)

**mülkiyet zamiri:** zemîrê wayîrîye (n)

**N**

**ne kadar ... o kadar:** çende... ende...

Ben ne kadar biliyorsam sen de o kadar biliyorsun. (Çende ez zana ti zî ende zanî.)

**ne... ne de...:** ne ... ne ...

Ne okumuş, ne de yazmış. (Ne wendo ne zî nuştö.)

**nesne:** obje (n)

**niteleme sıfatı:** sifetê senîniye (n)

**nizamlı:** biserûber, -e; nîzamin, -e; întîzamin, -e

**nizamsız:** bêserûber, -e; bînzam, -e; bîntîzam, -e

**nötr:** notr

**nötr ad:** nameyo notr (n)

**nötr isim:** nameyo notr (n)

**O**

**o (eril):** 1)o (n) 2)ey (n); 3)a () 2)aye (m)

**olumlu:** pozîtîf, -e

**olumlu cümle:** cumleya pozîtîfe (m)

**olumlu soru:** perso pozîtîf (n)

**olumsuz:** negatîf, -e

**olumsuz cümle:** cumleya negatîfe (m)

**olumsuz soru:** perso negatîf (n)

**olumsuzlama edatı:** edatê negatîfiye (n)

**ora:** uca, weyra

**orası:** uca, weyra

**Ö**

**önedat:** veredat (n)

**örgütleme:** organîzekerdiş (n)

**örgütlenme:** organîzebîyayîş (n)

**özel:** taybetî (n), taybetîye (m)

**özel ad:** nameyo taybetî (n)

**özel isim:** nameyo taybetî (n)

**özgür:** azad, -e

**özne:** kerdox, -e

**P**

**parti:** partiye (m)  
**poligon:** cayê çekeştişî (n), poligon (n)

**R**

**rahat:** asan, -e  
**rahat!** (emir): rehet!

**S**

**sağ:** rast  
**sağ taraf:** heto rast (n), perro rast (n), polo rast (n)  
**saldırı:** hêriş (n), gale (m), galim  
**saldırmak:** hêriş kerdene, gala ... kerdene, galim kerdene, galime pira nayene, ramitene ser  
**sağlık:** weşîye (m)  
**sağlık bakanlığı:** wezaretê weşîye (n)  
**sanal geçmiş zaman:** demo vîyarteyo niyetin (n)  
**sayı:** hûmar (m)  
**sayı sözcüğü:** hûmarname (n)  
**serbest:** serbest  
**sesli:** vengin, -e  
**sesli harf:** herfa vengine (m)  
**sessiz:** bêveng, -e  
**sessiz harf:** herfa bêvenge (m)  
**sıfat:** sifet (n)  
**sıfat tamlaması:** îzafeya sifetî (m)  
**sıra:** rêze (m)  
**sıra cümleler:** cumleyê rêzkî  
**silah:** çeke (m)  
**silah atış yeri:** cayê çekeştişî (n), poligon (n)  
**sis:** mij (n)  
**sol:** çep  
**sol taraf:** heto çep (n), perro çep (n), polo çep (n)  
**soru:** pers (n)  
**soru cümlesi:** cumleya persî (m)  
**soru işareti:** nîşanê persî (n)

**soru sıfatı:** sifetê persî (n)  
**soru zamiri:** zemîrê persî (n)  
**soru zarfı:** zerfa persî (m)

**söz:** vate (n), qisa (m), qesa (m)  
**strateji:** stratejî (m)  
**stratejik:** stratejîk, -e  
**stratejik yer:** cayo stratejîk (n)  
**su:** awe (m), awi (m)  
**sürgü** (silah sürgüsü): surme (n)  
**süvari:** espar, -e; suvarî (n), suvarîye (m)

**Ş**

**şart:** şert (n)  
**şart kipi:** raweya şertî (m)  
**şayet:** eke  
Şayet biliyorsan söyle, bilmiyorsan sor. (Eke ti zanî vaje, eke ti nêzanî biperse.)  
**şehîrî:** şaristanij, -e  
**şehît:** şehîd, -e  
**şehît düşmek:** şehîd bîyene  
**şehît olmak:** şehîd bîyene  
**şimdiki:** nikayin, -e  
**şimdiki zaman:** demo nikayin (n)  
**şimdiki zamanın hikayesi:** demo vîyarteyo nikayin (n)

**T**

**takı:** suffiks (n)  
**taktik:** taktîk (n)  
**tamlama:** îzafe (m)  
**taraf:** het (n), perr (n), pol (n)  
**tekil:** yewhûmar  
**tekil ad:** nameyo yewhûmar (n)  
**tekil isim:** nameyo yewhûmar (n)  
**toplantı:** kom bîyayene  
**tümce:** cumle (m)  
**tümleç:** tamamker (n)  
**türemiş:** viraşte (n), viraştîye (m)

**türemiş fiil:** karo viraşte (n)  
**türemiş kelime:** çekuyo viraşte (n)  
**türemiş sıfat:** sifeto viraşte (n)  
**türemiş sözcük:** çekuyo viraşte (n)

## U

**ucuz:** erjan, -e  
**ucuzluk:** erjanîye (m)  
**ufak:** hurdî  
**ulus:** millet (n)  
**ulusumuz:** milletê ma (n)  
**ulusal:** milî  
**uyarı:** balantiş (n), îqaz (n)  
**uyarma:** balantiş, pêhesnayîş, îqazkerdiş  
**uyarmak:** bal antene, îqaz kerdene  
**uygar:** medenî, -ye

## Û

**ünlem:** înterjeksîyon  
**ünlü:** vengin, -e  
**ünlü harf:** herfa vengine (m)  
**ünsüz:** bêveng, -e  
**ünsüz harf:** herfa bêvenge (m)  
**üye:** endam, -e  
**üyelik:** endamîye (m)  
**üzüntü:** dej (n)  
**üzülmek:** dejayene

## V

**vilayet:** 1) wîlayet (n) 2) şaristan (n), bajar (n)

## Y

**ya... ya...:** yan ... yan ...  
 Ya ben gelirim, ya da sen. (Yan ez yena yan ti.)  
**yakın sanal geçmiş zaman:** demo vîyarteyo  
 nîyetin o nezdî (n)  
**yalın:** xoser, -e  
**yalın ad:** nameyo xoser (n)  
**yalın isim:** nameyo xoser (n)  
**yapabilmek:** şayene (şayîş), eşkayene  
 (eşkayîş), besekerdene  
**yara:** birîne (m), dirbete (m)  
**yaralı:** birîndar, -e; dirbetin, -e  
**yardımcı:** ardimkerdox, -e  
**yardımcı fiil:** karo ardimkerdox (n)  
**yaşam:** heyat (n)  
**yaşamak:** ciwîyayene  
**yazmak:** nuştene, nivisnayene  
**yer:** ca (n)  
**yer zarfı:** zerfa cayî (m)  
**yön bildiren zarf:** zerfa hetî (m)  
**yüklem:** kardar (n)

## Z

**zaman:** dem (n)  
**zaman zarfı:** zerfa demî (m)  
**zarfsal sayılar:** hûmarnameyê zerfkî  
**zincirleme tamlama:** îzafeya rêzilkî (m)

## WENDOXAN RA

**N**a hûmare de wendoxanê ma yê kurmancan û kurdanê rojhelatî ra di tenan ma rê mektubî nuştî, ma bi keyfweşîye nê her di mektuban neşr kenî. Seke şîma vînenî, Mamo Cûmijî mektubê xo bi kirmanckî (zazakî) nuşt. Herçiqaş kirmanckîya ey de şaşî estî zî ma mektub sey nuştîşê ey nuşt. Çunkî ma zanî ke asan niyo ke kurmancê başûrê rojhelatê Kurdistanî -yê bindestê Sûriye- bişîyê kirmanckî binusî.

Mektubo bîn yew kurdê mehabadijî, Dr. Emîr Hesepûrî bi lehçeya xo nuşt. Hûmay her di wendoxan ra razî bo.

*Vate*

\* \* \*

Alfortville (Fransa), 21. 10. 1998

**B**irayanê erjayî,  
Mi kovara Vate ewro gurot; ez şîma [rê] sipas keno. Mi şîma ra nuştîbî ke namnîşana mi amey viyartiş.

Şîma şînasnenî ke ez kirdî waneno û nivîsneno; na nameye de ez wazeno ewniyayîşê xo çend meselanê “Kombiyayîşê Pancine yê kirmanckî” ser o bidî. Eger rojêk bibo, ez zî hez keno kombiyayîşê şîma de amade beno. Ganî kirdasanê kirmancîzan kî miyanê şîma de bî.

### Derheqê nê çekuyanê cêrnan de

*Meylê kombiyayîşî* ..... *Formê bînî* ..... *Kirdasî*  
çike ..... çî ke ..... çî ku  
seke ..... se ke ..... wekî, çawa ku  
hûmar ..... hûmare ..... hejmar  
çitur ..... çî tur ..... çî tewr, çî ton  
Kurdîstan ..... Kurdistan ..... Kurdistan

Se ke şima zî zanî ke “çike“, “çitur“ û “seke“ di çekuyan ra yenî pê: çî+ke, çî+tur, se +ke; înan ra vajiyênî “locution conjonctive“. Ewniyayîşê mi gore, gerek o nê çekuyî ciya yenî nivisnayene.

Barê “hûmar“ de kî, şima xo xo vanê ke çekuyê makî dim a paşpirtika “-e“ esta; sinî şima paşpirtika “-e“ ay ra birnenî, an forma vê “-e“ qebul kenî?

“Stan“ wata xo “hard“ a, “welat“ a, “herêma“. Ewro no çekuy “prothèse“a “i-“ an zî “î-“ nas keno: istan, îstan; çend nimûney bînî: istanik, îstîrî, istran, istandin, isto, istiri.

Raşt niyo ke kurd pêro bivazî “Kurdistan“ û yew parê bînî miletê ma ra bivazî “Kurdîstan“. “I-“ û “î-“, her di “prothèse“ yî; ferq nîsta.

### Babetê tîpanê “J“, “C“, yan “Z“ de

Ez serwext beno ku şima waşto *Vate* nezdiyê zaravandê bînî bikerî. No çiyoy xirab niyo, labelê zanayîşê mi anegore, tîpa “z“ durvê zarava zazakî yo. Apê Osman Sebrî va: Zaza, yanê no mordemo ke tim tîpa “z“ a veng keno. Belkî ma bivazî ke ney yew îtimolojiya gelêr a, labelê tayê raştîye te de esta.

### Vîrgul miyanê cumlan de

*Meylê kombiyayîşî ..... Nuştişê bînî*

Çende ez zana ti zî ende zanî. .... Çende ez zana, ti zî ende zanî.

Çi cinî çî camêrd heme amey. .... Çi cinî, çî camêrd, heme amey.

Ge ez yena ge ti yenî. .... Ge ez yena, ge ti yenî.

Ha ez ha ti, ferqê ma çin o. .... Ha ez, ha ti, ferqê ma çin o.

Ez xo biyayîşê vîrgul raşt vînon, çî ke her yew cumley de du-hîrî “proposition, pêşniyar“ estî. Loma ra vîrgul pêwîst o.

### “Ke“ û vîrgul

No derheqî de, ewniyayîşê şima cayê xo de yo. Heta kirdasanê ma zî xo şaş kenî û “ke“ pey ra vîrgul nivisnenî. Ney, çewt o. “Ke“ jey ra vajiyênî

*Vate* \_\_\_\_\_

“conjonction“, angó “hemgurotiş“; nêbeno ke mordem vîrgul dano [rono].

### **Karê “biyayene“**

Ez vurnayişê “b“ û “v“ ser o nevendo; labelê ez wazeno derheqê ciyakerdişê karê “biyayene“ binivisnen. Gama ke karê “biyayene“ beno alîkarê yew karo serek û dema (çax, time, temps) kar vuriyêna, ganî karê “biyayene“ ciya yeno nuştene:

*Meylê kombiyayîşî* ..... *Meylê mi*

O bîbî. .... O bî bî.

Her di bîbî şehîd. .... Her di bî bî şehîd.

Di cayan ra dirbetin bîbî. .... Di cayan ra dirbetin bî bî.

Şima xapitîbî. .... Şima xapitî bî.

Kênekî şîbî. .... Kênekî şî bî.

Silavên min li we bin û overkewtişê karê şima wazeno.

**Mamo Cûmij**

\* \* \*

North York (Kanada), 31. 11. 1998

**B**erêz Malmîsanij,  
Paş silawêkî germ û gurr, pirr memnûn im bo nardinê *Vate*. Dest-tan xoş bê, govarêkî baş û rêk û pêk e.

Le hûmarî 4 (wisar 1998) da, raportî govarî *Le Temps* sebarete be jenosîdî 1937 bilaw kirawetewe (rûperî 102-104).

B. Nikitine le katî xoy da welamî ew nûsrawey *Le Temps*-î dabowe belam rojnamey *Le Temps* welamekey Nikitine-î bilaw nekirdewe. Ew welamey Nikitine le laperey 303-304î kitêbekey hatuwe (*Basile Nikitine, Les kurdes étude sociologique et historique, Editions d’Aujourd’hui, 1975*). Min-îş ewe fotokopîyeke-tan bo denêrim.

Arezûy serkewtin-tan dekem.

**Amir Hassanpour**



Le 1<sup>er</sup> septembre 1937.

LETTRE DE L'AUTEUR AU DIRECTEUR DU JOURNAL *LE TEMPS*  
(qui n'a pas été publiée).

Monsieur le Directeur,

